# Rûpelek nû

»»» R:10




## Şorişa bi îrade ya gel

»»» R:6

## Li Neteweyên Yekbûyî û Yekîtiya Ewrûpayê tevgerên li dijî Tehranê bihêz dibin!

»»» R:7

## Rojavayê Kurdistanê di navbera dagîrkerî û êrîşên Tirkiyê de

»»» R:8


*Bidestveanîna mafên neteweî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

www.agirimedia.org Hejmar (435) 06-12-2022 Buha (1000) Tûmen


# Mistefa Hicrî: Welatên derve hewce ye ku digel Kurd bikevitin gotûbêjan û siyasetên xwe li hember rejîma Îranê biguherin

Mistefa Hicrî, Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî yê Partiya Demokrat di 26`emîn kongreya Rêkixirava "Enternasyonal Sosyalîst" de, dengê mafxwazî û raperîna nû ya xelkê Îranê ya li dijî Komara Îslamî gihandin wê rêkxirava navdewletî. Mistefa Hicrî ragihand, welatên derve hewce ye digel Kurd bikevin gotûbêjan û siyasetên xwe li hember rejîma Îranê biguherin.

Mistefa Hicrî, di vê gotara xwe de ku roja Şemî 5`ê Sermaweza 1401`an(26`ê Çiriya Paşîn a 2022`an) û di duyemîn roja kongreyê de pêşkêş kir, binyat û sedemên sereke yên serhildana şoreşa "Jîna"yê û taybetmendiyên cuda yên wê raperînê bo beşdarbûyên kongreya "Enternasyonal Sosyalîst"ê şirove kir. Berfirehiya raperînê ku di 31 parêzgehên Îranê de û radîkalbûna silogan û daxwaziyan, hevpeywendî dinavbera pêkhateyên cuda yên welat û derbasbûn li tewahiya Komara Îslamî ya Îranê çend taybemendiyên sereke yên wê raperînê bûn ku di




gotarê de Mistefa Hicrî tîrêj xiste ser.

Berpirsê Navenda Birêveberiya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê di berdewamiya behsa xwe de got: Xelkê Îranê niha bi tewahî di beşdariya siyasî û îradeya diyarî kirina çarenivîsa xwe de hatine bê parkirin û heta kêmtirîn mafê siyasî û medenî jî ji wan re nehatiye diyarî kirin û bi sedema îstîsmarkirina serçaveyên aborî ji aliyê bazineya desthilatê ve û ji aliyê derve siyasetên Komara Îslamî û piştevanîkirina rejîmê ji terorîzma dewletî ku bi herdedana samana nîştimana welat û sizayên aborî yên cîhanî yên li dijî Îranê li pey kevtiye û di nav tengasiyeke yekcar zêde de kevtine. Mistefa Hicrî di encama gotinên xwe yên di vê beşê de got ku, Komara Îslamî ya Îranê xelkê wî welatî bi mebestên îdolojîk yên xwe bi dîl girtiye û niha Komara Îslamî ya Îranê mezintrîn metirsiye bo ser ewlehî û jiyana xelkê Îranê.

Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî yê Hizbê di beşek din a gotinên xwe de nirxên xuya yên wê serhildana cemawerî, wekî xwasta azadî, pêdagîrî li ser mafê demokratîk yên neteweyan, demokrasî, layîkbûn(sêkolarîzim) û wekhevîxwaziya civakî û zayendî bi hûrî bo beşdarbûyên kongreyê dest nîşan kir û got, Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê zêdetir ji heft dehk in ku bo wan biha û nirxên cîhanî xebatê dike û di vê pêxemê de qorbaniyek zêde jî daye.

Mistefa Hicrî di beşa dawî ya gotinên xwe de li ser vê yekê pêdagîrî kir ku, girêdana arîşe û kirîzên Komara Îslamî bi arîşeyên navkî yên wî welatî ve tenê di berjewendiyên reîjmê de dişkên û mezintirîn arîşeya Komara Îslamî ew e ku rewabûna vê tune ye û metirsiya herî mezine jî bo ser ewlehiya civaka cîhanî. Her ji ber vê yekê ye ku welat û civaka cîhanî dibe piştgiryê bidin bi raperîna xelkê û digel hêzên Kurdî bikevin bi gotûbêjan û siyaseta heta niha ya xwe ya digel Komara Îslamî jî biguherin.

Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî yê Hizbê dawîn car got: Partiya Demokrat reşnivîşa biryarnameyekê pêşkêşî kongrê kiriye ku, hêvîdar im endamên kongrê vê bipejrînin û pêngavek bikiryar bona cî bi cî kirina vê havêjin.

26`emîn kongreya Rêkxirava "Enternasyonal Sosyalîst" di roja Înê 4`ê Sermawezê(25`ê Çiriya Paşîn) de, li bajarê Madrîd a Spaniyayê bi beşdariya heyeteke payebilind a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê destpê kiriye û 3`ê rojan berdewam dibe. Di roja yekem a karê Kongireyê de, bo rêzgirtin ji xebat û tekoşîna Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê li pêxema aştî, azadî û dadperweriya civakî, nameya rêzgirtinê pêşkêşî Partiya Demokrat hat kirin.

# Opozîsyona Tirkîyeyê jî di pêşniyarîya xwe ya Qanûna Bingehîn a Nû da behsa Kurdan nake



**N: Mustafa Oziçelik**
**Serokê Giştî yê Partiya PAK`ê**

Opozîsyona Tirkîyeyê(partîyên mixalefetê), ku bi navê ‘’Partîyên Maseya Şeş Alî’’ têne pênase kirin, roja 28.11.2022yê li Enqereyê, di civîneke danasînê da, pêşniyarîyên xwe yên di derbarê naveroka Qanûna Bingehîn a Nû da pêşkêşî raya giştî kirin. Partîyên Maseya Şeş Alî, ji CHP, Îyî Partî, DEVA Partîsî, Gelecek Partîsî, Saadet Partîsî, Demokrat Partî pêk tên.

Partîyên Maseya Şeş Alî, bi navê ‘’Qanûna Bingehîn a Sîstema Parlamenterîyê ya Bihêzkirî’’ reşnivîseke Qanûna Bingehîn amade kirine û roja 28.12.2022yê bi navê ‘’Nuha Wexta Demokrasîyê ye’’ esasên vê reşnivîsa Qanûna Bingehîn pêşkêşî raya giştî kirin.

Partîyên Maseya Şeş Alî, dibêjin ’’Emê Sîstema Serokatîyê ya heyî biguherînin û Sîstema Parlamenterîyê ya Bihêzkirî bînin. Emê nehêlin bêyî biryara mehkemeyan serokên şaredarîyan ji wazîfeyên xwe bêne bidûr xistin. Emê benda hilbijartinê ji %7ê daxin %3yê. Emê ji holê rakirina mafê parlamenterîyê zehmettir bikin. Emê selahîyetên Serokkomar kêmtir, selahîyetên parlamentoyê zêdetir bikin. Emê xweserîya dadgehan bicîh bînin….’’ Partîyên Maseya Şeş Alî, behsa mafê mirovan, azadîya ramanî, azadîya xebata birêxistinî dikin; behsa, demokrasîyê, edaletê, wekhevîyê dikin.

Van tesbît û gotin û pêşeniyarîyên Partîyên Maseya Şeş Alî, kêm zêde di gelek qanûnên Tirkîyeyê û di Qanûna Bingehîn a berê da jî hebûn. Lê mixabin vaye 99 sal e, azadî jî, demokrasî jî, edalet û wekhevî jî yan nîvqurmiçî bûne, yan jî qet pêk nehatine.Van tiştên têne gotin hema hema bi piranî li ser kaxezê mane. Û tu garantî tunene ku, dê Partîyên Maseya Şeş Alî dê van gotinên xwe jî bicîh bînin an na.


Bêyî mafê kurdan li Tirkîyeyê jî rêya demokrasîyê venabe

Tiştê herî balkêş jî eve ku, di wê civîna bi navê ‘’Nuha Wexta Demokrasîyê ye’’ hate li dar xistin da ,ku esasên vê pêşniyarîya Qanûna Bigehîna Nû ji raya raya giştî ra hate pêşkêş kirin, qet behsa kurdan nehatîye kirin.

Gotinên Partîyên Maseya Şeş Alî, heger bêne bicîhanîn, helbete ku dê ji rewşa nuha heyî baştir be. Lê, aşkere ye ku bi van çend makyajan ne mimkune ku demokrasî, azadî, edalet, wekhevî pêkbê. Di salên 2002-2010an de AK Partîyê ji van gotinên Partîyên Maseya Şeş Alî zêdetir tişt gotibûn û hinek ji wan jî bi awayekî nîvçe be jî, bicîh anîbû.

Di eslê xwe da, îspat bûye ku tûrnûsola destpêka demokrasîya li Tirkîyeyê, naskirina nasnameya kurdî û qebûl kirina mafê perwerdeya bi zimanê kurdî ye. Heta ev gav di Qanûna Bingehîna Tirkîyeyê û di hemû yasayên peywendîdar da neyên bicîh kirin, dê derîyê demokrasîyê venebe. Ew qeyd û bendên ku di stûyê kurdan da ne, di eslê xwe da dest û lingên Tirkan jî girê dide.

Di pêşniyarîyên Partîyên Maseya Şeş Alî da, hûn dest ji mafê çarenûsîya miletê Kurd, mafê statuyeke sîyasî û mafên kolektîf yên kurdan berdin; bi yek gotinê be jî behsa hebûna kurdan, behsa mafê perwerdeya bi zimanê kurdî jî nayê kirin. Ango Partîyên Maseya Şeş Alî, 25 milyon kurdên li Bakurê Kurdistanê û li Tirkîyeyê tune dihesibînin .




Ji xwe, Serokomarê Erdoğan û desthilatdarîya Tirkîyeyê ya ku ji AK Partî û MHPyê ve pêk tê, dibêjin ‘’Tu pirseke me ya bi navê pirsa Kurd tuneye’’ û sîyaseteke li ser esasê dijayetîya Kurdan dimeşînin.

Erdogan bi dewleta kûr a Tirkîyeyê ra peymanek çêkirîye, lihevkirîye, bi navê sîstema serokatîyê îdareyeke takekesî dimeşîne. Û Dewleta Tirkîyeyê bi taybetî piştî temûza 2015an, careke din şer destpê kir, stratejîyek nû da ber xwe ku dibêje ‘’Nabe li tu derê cîhanê Kurd mafekî, statuyekê bidest bixin û destkeftinên heyî jî divê pêşdetir neçin’’. Erdogan di navbera salên 2002-2010an da, ji ber peywendîyên Tirkîyeyê û Yekitîya Ewropayê di derbarê zimanê kurdî û hinek mafên demokratîk da, hinek gavên baş avêt. Lê nuha, di derbarê Kurdan û mafên demokratîk, mafên mirovan sîyaseteke gelekî tûnd û totalîter dimeşîne.

Lê opozîsyona Tirkîyeyê jî, di wê pêşniyarîya xwe ya ji bo Qanûna Bingehîn ya ku ji raya giştî ra aşkere kirîye da, di derbarê Kurdan da behsa tu mafan nake. Herweha ji xeynî hinek gotinên glover, elastîk û şêlû yên di derbarê demokrasî, azadî û edalatê da , mixabin ne xwedîyê tu bernameyekê ye ku ji bo maf û azadîyan bawerîyê bide gelê Tirk jî.

Opozîsyona Tirkîyeyê di sîyaseta li dijî Kurdên Başûr, Rojava û Rojhilat da jî; li dijî Kurdên bakur û kurdên li Tirkîyeyê dijîn da jî, hema hema bi giştî wek desthilatdarîyê helwest digire, difikire.

Îro aşker bûye ku, di hilbijartina Serokkomarîyê ya 2023ê da, dengên kurdan dê roleke tayînker bilihîzin. Di rewşeke weha zelal da, pir balkêşe ku AK Partî û MHP jî (Tifaqa Cimhûr), partîyên opozîsyonê, ango Partîyên Maseya Şeş Alî jî, li himberî kurdan bibêminetî , bêxemî tevdigerin, tu pêwîstîyê nabînin ku daxwazên kurdan bixin bernameyên xwe yên hilbijartinê û guhertinên Qanûna Bingehîn.

Partîyên desthilatdar jî, yên opozîsyonê jî, bêyî ku hebûn û tu mafên kurdan qebûl bikin, kurdan bes wek amûr û pêlikekê dibîn da ku li ser hikum bimînin an werin ser hikum.

Gelo ma ev helwesta bibêminetî ya partîyên desthilatdar û yên opozîsyonê yên li himberî kurdan, helwestên normal in? Helbete ku ev helwest ne helwesteke normal e.

Dewleta Tirkîyeyê ji bêtifaqîya kurdan û ji nakokîyên di navbera Emerîka û Rûsyayê feydê werdigire
Meriv dikare bêjê ku sebebeke esasî ya

»»»Dom R:3

»»»Doma R:2

vê helwesta desthilatdarîyê û opozîsyonê, rewş û bêtifaqîya kurdên Bakurê Kurdistanê ye, sebebek jî helwest û sîyaseta dewletên mezin e. Dewleta Tirkîyeyê, ji şerê Ûkrayna û Rûsyayê û ji nakokîyên di navbera Emerîka û Rûsyayê, ji nakokîyên di navbera Tirkîyeyê û Êmerîkayê, Dewletên Ewropayê û NATOyê da hene feydeyeke mezin werdigire. Dewleta Tirkîyeyê ne bes li Rojava û Başûrê Kurdistanê, li Bakurê Kurdistanê jî , vê firsenda ku ji ber van alozîyên li herêma rûdane , li himberî Emerîka û dewletên din bikar tîne.

Emerîka û dewletên Ewropayê, ji bo ku Tirkîye zêdetir nekeve dawa Rûsyayê û ji ber berjewendîyên xwe yên li Rojhilata Navîn çavên xwe ji gelek kiryar û êrîş û sîyasetên Dewleta Tirkîyeyê yên li himberî kurdan digirin. Ev jî him desthilatdarî, him jî opozîsyona Tirkîyeyê li himberî kurdan bêperwa dike, bê minet dike. Kurd di qada navneteweyî da bêpişt dimînin, piştgirîya kurdan lawaz dibe.

Sebebeke din ya esasî ya rê dide ku desthilatdarî û opozîsyona Tirkîyeyê li himberî kurdan bibêminetî tevbigerin, kurdan tune bihesibînin ewe ku, kurd bi xwe bêtifaq in, kurd wek terefekî tevnagerin. Ji ber ku kurd wek miletekî, li ser daxwazên xwe yên neteweyî, ziman û kulturî wek terefekî tevnagerin, hêza 25 milyon kurdên Bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê, mixabin berhewa dibe, li erdê diteqe. Ji ber ku Kurd ne bitifaq in, li gel vê hêza xwe jî nikarin desthilatdarî û opozîsyona Tirkîyeyê mecbûr bikin da ku kurdan nas bikin, mafên kurdan qebûl bikin.

Divê kurd li ser daxwazên xwe yên acîl dest bidin hev, nebin pêlikên tu alîyan Di rapirsînên van demên dawî hatine kirin da aşkere bûye ku, ji %90ê kurdan dixwazin nasnameya kurdî û perwerdeya bi zimanê kurdî ji alîyê Dewleta Tirkîyeyê bêne qebûl kirin û di Qanûna Bingehîna Tirkîyeyê da bêne garantî kirin.

Li gel ku Dewleta Tirkîyeyê, bi zerar dayîna aborîya gel, bi zordarî, êrîş, kuştin, girtin û hevs kirinên xwe xwestîye gelê Kurd teslîm bigire, bişkîne jî; li gel ku kurdan ji wê sîyaseta xelet a xendek û barîkat û çalakîyên çekdarî darbe û şikesteke mezin xwarine jî, miletê kurd li nasnameya xwe û li mafê perwerdeya bi zimanê xwe xwedî derdikeve. Ev rastîya ku di rapirsînan da derketîye holê, hêvîyên me geş dike. Divê hemû partî, grûb û tevgerên sîyasî yên kurdan, dezgehên sivîl û kesayetên kurdan vê mesaja gelê me baş bixwînin û li ser daxwazên acîl ên kurdan dest bidin hev, bihev ra helwestekê bigirin.

Heger kurd bi awayekî berfireh li ser daxwazên xwe yên acîl dest bidin hevdu, di guhertina Qanûna Bingehîn a qismî da dê bikaribin tesîreke mezin bikin, dê bikaribin destê xwe xurtir bikin.
Li Bakurê Kurdistanê pirsa Kurdistanê pirsa mafê çarenûsîya miletê Kurd e. Li ser esasê wekhevîya miletê Kurd û miletê Tirk, şirîkatîyeke federalî ya Bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê jî beşeke ji mafê çarenûsîyê. Ji bo kurdên li Tirkîyeyê dijîn jî, pirs, pirsa mafên ziman, kultur û mafên demokratîk in. Helbete ku em dikarin li ser Qanûna Bingehîn a Federalî ya ku li ser şirîkatîyeke wekhevîya du miletan hatîye danîn jî li gel rayedarên Dewleta Tirkîyeyê li hev bikin.

Lê heta ku em wek miletê kurd bigihêjin sîstemeke şirîkatîya federalî, bigihêjin wê asta çarenûsîya qedera xwe, di şerdên îroyîn da em dikarin bi destxistina mafên xwe yên acîl rê ji çareserîya pirsa Kurd û Kurdistanê ra xweştir bikin. Daxwazên acîl ên kurdan, di eslê xwe da îro daxwazên hevbeş ên bi milyonan kurdên ku li Tirkîyeyê dijîn û yên bi milyonan kurdên Bakurê Kurdistanê ne.

Divê kurd xwe nexin bin sîya Tifaqa Cimhûr jî, ya Partîyên Maseya Şeş Alî jî. Tifaqa Cimhûr û Partîyên Maseya Şeş Alî, herdu jî , ji bo parastin, berdewamî û xurt kirina serwerîya Dewleta Tirkîyeyê hatine ava kirin.

Lê belê, heta îro ji bo zimanê kurdî, ji bo bicîhanîna mafê mirovan û mafên demokratîk, ji bo bicîhanîna azadîya xebata rêxistinî û azadîya ramanî, ji bo bi rêya dîyalogan çareser kirina pirsgirêkan kê çi gavên êrênî avêtibin, me her gotîye ''Têrê nake, lê baş e'' û me piştgirîya wan gavan kirîye. Û ji îro pê ve jî emê her bi vê hişmendîyê tevbigerin.

Divê li ser daxwazên xwe yên acîl em dest bidin hev û li himberî partîyên desthilatdar jî, yên opozîsyonê jî em wek terefê kurd tevbigerin. Helbete gava ku kurd bibin yek divê li Tirkîyeyê jî dost û piştgirên xwe zêde bikin û bi wan ra rêyên hevkarîyê xurt bikin.

Tecrubeyên 99 salî yên Dewleta Tirkîyeyê îspat kirîye, heta Kurd mafên xwe yên acîl bidest nexin, heta hebûn û mafê kurdan di Qanûna Bingehîn da neyên bicîh anîn, heta ji bo çareserîya pirsa Kurd û Kurdistanê rê venebe, li Tirkîyeyê jî, dê rê ji demokrasî, azadî, wekhevî, edaletê ra venebe.

Aşkere ye ku hêz û tifaqa me tenê têra serkeftinê nake. Divê em wek alîyê kurdan di qada navneteweyî da dijminên xwe kêm, dostên xwe zêde bikin. Divê em bi xebateke berfireh ya li dîasporayê, piştgirîya dewlet û gelên cîhanê werbigirin.

Mustafa Ozçelîk

Serokê Giştî yê PAKê

## Çileya Sarîna Saidî li goristana Beheşta Mihemedî ya bajarê Sineyê bi rê ve çû

Îro roja Duşemî 14ê Sermaweza 1401an a Rojî, çileya Sarîna Saidî li goristana Beheşta Mihemedî ya bajarê Sineyê bi amadebûna xelkek zêde bi rê ve çû û xelkê amade li dijî rejîmê silogan dan.



Êvariya roja Çarşemî 4ê Xezelwerê, Sarîna Saidî ya 16 sal û keça Haşim, di nav xwenîşandanan de ji ber lêdana hêzên ewlehî yên rejîma serkutkar bi giranî birîndar bibû û bi sedema giraniya birînên xwe canê xwe ji dest da.

# Rostem Cihangîrî: “ Rejîm tûşî şikaneke mezin bûye, gelên Îranê êdî çawnetirs bûne û sokan û şeqaman çol nakin”



Rostem Cihangîrî Berpirsê Navenda Çavdêrî ya PDKÎ



**Me digel Rostem Cihangîrî Berpirsê Navenda Çavdêriya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê li derheq şoreşa jinê li Rojhilatê Kurdistan û Îranê hevpeyvîn pêk anî û navbirî got: “, rejîm tûşî şikaneke mezin bûye, gelên Îranê êdî çawnetirs bûne û sokan û şeqaman çol nakin”**

**P: Rêzdar Rostem Cihangîrî niha em dibînin ku keç û jinên Rojhilatê Kurdistanê li ser şeqaman xavika xwe di esman de hihejînin an jî agir berdidinê û ev yek bûye sembolek, bi nerîna we ev tenê serkotiyê dixwazin an remiz an daxwaziyek din pişt vê hereketê de heye?**

**B:** Belê eva ku keç û jinê Rojhilatê Kurdistan û Îranê,xawik û desmala serê xwe hildigirin an bidestê xwe dihijînin, anjî dişewitînin, dibe bêjim keç û jinan koletiya rejîma Îslamî red dikin, dibêjin em wê nizama faşîst a olî naxawazin dibe hiloşe, hikumetek bê ser kar û azadî û serbestîyê bo hemû qadên civaka Îranê bixasma Rojhilatê Kurdistanê bê cî bi cî kirin, lê, wê hikumeta faşîsta olî ne jin dikarin bi Azadî û serbestiyê jîyanê bikin li nava civakê de bi însanê derece dû çaw lê tê kirin.çon li wê hikumeta Îslamî de jinan ti mafek çi li mal û çi li civakê de nine. Her ji ber vê yekê ye ev zilm û zodariya li ser civaka Îranê heye li wê hikumetê de,sed qat li ser jinê zêdetir e. Ev hikumeta jinê tenê bo mitfaqê û milkê mêr û zarok çêkirinê û xwedîkirinê dixwaze û ti rêyek bo van nehêlaye bikarin rol û neqşek li welat de bibînin. Li qanûna komara Îslamî de jin bi şahidekê tê qebûl kirin,li nava malê bo mafê mîratê dû xwîşk bi birayekê tê hisbandin û ji ber vê heqê jina ye ku wê nizamê nexwazin, desmala serê xwe radikin bi tevahî Komara Îslamî red dikin.

**P: Rêzdar Rostem Cihangîrî di serhildana Rojhilatê Kurdistan û Îranê de Kurdistan pêşeng e, pêka hereketa ku niha heye aliyên din yên Îranê jî karîne pêka zirûfa heyî beşdar bin?**

**B:** Rojhilatê Kurdistanê hûn dizanin ku li hatine ser kara wê hikumetê ew nizama qebol nekirine, li rapirsîya ku bo wê hikumetê li sala 1979`an de hat kirin, Rojhilatê Kurdistanê pişikdarî nekir got ev nizama nizamekî nenaskirî ye û dibe ku bibe belaya ser xelkên Îranê, mixabin wî serdemî kesê li Îranê dengê Rojhilatê Kurdistanê nebihîst, heta hizb û rêkxiravên siyasî û civakî û herwisa ya ecêb ew bû ku hizbên Çep û Komonîst ji dengê berheq yên Kurdan li Rojhilat nebihîstin, bigire gotin ew hikûmeta dijî împiryalîzma Amerîkayê ye, Kurdistana Rojhilat xolamokên Amerîkayê ne.

Paş derbas bûna salan derkevt ku hizr û ramana Rojhilatê Kurdistanl rast e. Lê, êdî hikumetê ew hemû gelek rihet tepeser kirin, lê, nekarîn Kurdistanê tepeser bikin, çimkî Kurdistan xwedanê hizb û rêkxiravên sîyasî yên xwe bûn, ew nizama baş naskiribûn, li nîyeta serê melayan baş têgehiştibûn, xwe bo xebatekî dûr û dirêj amade kirin?! Hûn dizanin ew xebata heta niha jî didome, bo wê hindê Komara Îslamî ti pêgeheke civakî û sîyasî nine. bi derbasbûna zêdetir çar dehikan, êdî Rojhilatê Kurdistanê tecrûbeyên baş bidest xistine, dujmînê xwe çak nas dikin, gelekî sîyasî û mafê xwe yê Neteweyî dixwaz in, têgehiştî û rêxistinîye, bo her pîlaneke rejîmê Komara Îslamî yan taktîk û biryarên xwe hene, her semxereta wê hindê ye ku li Rojhilatê Kurdistanê pir nigeran û ditirse, wek dibînî tepeser kirin li Rojhilatê Kurdistanê gelek bêrehmanetir û cinayetkarenetir e, em dibîn,mixabin, li navçên din yên Îranê, bixasma cihê Farsan wisa nine, ewan direng dest pêkirin û heta wê domahiyê jî nedixwastin rejîm hiloşe?! Her dixwastin îslahatek û gorankaryek li nava rejîm rûbide hinek azadîyên civakî û kesî hebe, wekî din bila dewlet weke xwe be. Ew bîr û hizrê vêde here zora hizb û rêkxistinê sîyasî û civakî jî bû. Çimkî digotin eger Komara Îslamî li ber hev hiloşe êdî dawiya Îranê ye tiştek bi navê Îrana niha namîne û dê parçe parçe bibe. Diyare rejîm jî bo wê hizr û ramanê gelek xebat kir û karî nehêle Altirnatîfek bi dijî wê çê bibe.

Ji ber vê yekê yeku gelên encam dide û bixasmanî gelê Fars tevî wê hindê dijî rejîmî jî bûn?! Lê, wisa bawirî anîbû ku raste Komara Îslamî hiloşe? Îran dê parve bibe, heta wê dawiyê êdî zanîn ew hizr xelete, bi mifaha rejîmê tevaw bûye, êdî li şehîd kirina Jînayê de ew hizre bitevahî betal derket, xelkên Faris û gelên Belûç û Ereb û hinek Tirkên Azerî hatine meydanê. Mixabin bihizramin ewên ku nizamê naxwazn para herî mezin gelên Îranê ne? Lê ew para hemû nehatine ser şeqmaman.

Eger hemû navçeyên Îranê weke Rojhilatê Kurdistan û Belûçan hatibana ser şeqaman min pê vaye niha rewş corekî din dibû, yanî hikumeta Îranê yan nemabû? Yan jî gelek dê lawaz dibû?! Lê, dîsan baş hatine meydanê, hikumetê peyama gelên Îranê wergirtîye lê, naxwaze. Bersivek baş bide çmkî dizane bitevahî li beiyn biçe.

Ji ber çi dixwaze kuştina cinayekarane ya li Rojhilatê Kurdistan û Belûçistanê bi rêve dibe, dixwaze Tehran û bajarên din pê bitirsîne. Lê, dibe gelê Tehran û bajarên mezin nabe teslîmê wê tirsê bibin, dibe ku hemû qatên civakê jin û mêr xwandekar û dersxwan kedkar û karmend

»»»Dom R:5

»»»Doma R:4

rêkxistinên civakî û sîyasî bi mûkum û cidî bêne meydanê, gorzek yekcarî li keleşê wê hikumetê biwenîn,? Ji bo heta hetayî li kol gelên Îranê bikeve.

**P: Pêka benda 4 madeya 2 ya saziya navneteweyî hemû welat dibe pêbend bi peymana li derheq binpêkirina serweriya xaka welatên din bin, lê, Komara Îslamî ev çendîn car e ku bi bê hebûna ti belgeyekê partiyên Kurd yên Rojhilatê Kurdistanê, yên li Herêma Kurdistanê dike armac gelo sizayek bo Îranê heye eger wiha berdewam be?**

**B:** Komara Îslamî li kîjan bendê qanûnên navdewletî parastiye ku ewa te gotiye biparêze, hemû qanûn û yasa li gorî xwe û berjewendiyên xwe lêk dide, pirsyar lêre ewye Komara Îslamî serweriya Sûriye, Yemen, Lubnan, Felestîn û Îsraîlê dê parêze,e wa biheqê xwe dizan, yaku îro li Îraqê digozere, yê li Îraqê de tiştek binavê serweriya welat nemaye. Piştî hiloşîna rejîma Sedam Husên, êdî tiştek binavê serwerî nemaye, tênê li ser kaxezê maye. Li pêşde ewê hikimdariyê li Îraqê dikin bixwe darodestê Îranê ne, biryar û qirarên Îranê rêve dibin. Seba wê hindê ye ku Îran bi çawê parzgeheke xwe çav li Îraqê dike, piştewaniyê li hemû grûpên terorîstî dike dijî dewletê cîranan û gefan li hemû cîhanê û bixasmanî welatê rojhilata Navîn dixwe, heta niha Rêkxirava binavê Neteweyên Yekgirtî ti lêpirsîn an bexwedaniyeke micid bi wan nekiriye, her seba wê hindê birastî qirarên wê saziya nawdewletî bo Îranê cihê henekane, ti hesabekê bo naket.

Lê, ku mesele dibe Îran bilafasle xwe gîf mûr dike, basa serwerî û tenahiya welatê xwe dike.

Zaten Îran xwe bi qasidê Xwedê li ser erdê dizane hikumeta xwe jî bi hikumeta Îlahî dizan e, bi hikm,wezîfa îlahî ya xwe dizane ku ,dibe biryar û qirarên xwe li van dewlet û welatan de cî bi cî bike, bi gotina xwe şerî`eta Xweda û Qoraanê birêve dibe, rêka rast nîşanî van bide,seba wê ye ku ya dilê wî dixwazê dike,cîhan û dewletên xwedî qirar jî li hemberî wan de bêdeng in. Dena eger dewletên zilhêz bi micitî û mikûm bin, li hemberî van de,mûmkîn bû gelên Îranê jî îro li tev dewletekî terorîst û berela de rûbirû nebana,weke hemû milet û dewletên însandost û xwedan maf û demokirat bextewer yên cîhanê, jiyana xwe birêve bibana.

**P: Saziya navneteweyî komîteya lêkolîna heqîqetan li derheq serkutkariyên tûnd yên xwenîşanderan ji aliyê Komara Îslamî ve pêk aniye eger Komara Îslamî hevkarî neke an îzin nede ev Komîte dibe çi bike?**

**B:** Li welatên li rêkxiravên nawdevletî hene derheqê Îranê taze qirarek Êstandine ku komîte yan heyetekî lêkolîn û bidûreçûn ji bo peyda kirina rastiyan pêk bîne,?! Biçe Îranê bizanin ka çend raste ewa ku li Îranê rû dide?rastin an na?

Herçen peywdarê berdevkê hikumeta Îslamî a Îranê her zû ragehand ku lazim nake ew komîte pêk were bi tûndî red kir û got me bixwe komîta peydakirina rastiyan pêk aniye,? Lazim nake ew zehmetê bikêşin. Emê bixwe meselên xwe hel bikin?! wirdaye ka Îran wisa dibêje? Gelo komîta nawdevletî a rêkxirava navnetewî a mafên mirovan dê sera Îranê bidin dê bo rastiyan derin.

Yan eger Îran rêneda de çawan hemberî Îranê dê emel bikin,? An dê ber berjevendên welatan dê bêdengîyê biparêzin.

Çimkî ew komîtane bo welatên din jî weke Sûrîyê pêk hat, çimkî rastî gotin, lê, ti kirdeveyek li dijî dewleta Sûriyê nekin, ku bi sedan cinayetên hovane li wî welatî de kirin ku wan sor dizanîn ku sebebkarê van cinaytan dewleta Îranê ye. Hêv dikim wisa dernekeve, gelên Îranê bê hêvî nekin. Lê, ewa ku hatine deng û dibêjin dibe rastiyan peya bikin li cihê xwe de karekî başe. Hêvî dikim domahiya wê jî hebe?!

**P: Gelo Komara Îslamî bi berdewamî partiyên Kurdî li yên Rojhilatê Kurdistanê û dijberên hikumetê ne tawanbar dike bona wan nerazîbûnên navxwe, bi nerîna we wisa ye?**

B: Paşku Komara Îslamî pêk hat,destelata xwe biser tewahîya Îranê de sepand, bê ku hiç mûşkileyek bû bête pêş, hemû reqîbên xwe yêk ji dû yêk li urtê rakirin, lê, tenê nekarî Kurdistana Rojhilat bêdeng bike û destelata sîyasî ya xwe li Rojhilatê Kurdistanê de bicih bike, Komara Îslamî her li rojên ewilî gotênê ne? Ew destelate qebûl nekirin,û baş dizanin ku ev heyama nêzî 44 salane li Rojhilatê Kurdistanê de xebatekî tûnd tîj berdewame. Şar û gund deşt û nehalên Rojhilatê Kurdistanê bûne meydana şer, bi hezaran hêzên Komara Îslamî hatin kuştin û bi hezaran xelkê me li Rojhilatê Kurdistanê hatin şehîd kirin, bajar û gund hatin xirab kirin. Bi hezaran gencên me bi kiç û kurên me hatin gitin û îdam kirin, hemû Rojhilatê Kurdistanê kirine Padganên Eskerî, bi zahûra meselê tev Rojhilatê Kurdistanê dagîr kirine,?! Lê, nekarî gelê Komara Rojhilatê Kurdistanê bixine serçokan û teslîmê îrada xwe bikin, çimkî gelê kurdistanê û hizb û rêkxiravên Rojhilatê Kurdistanê, qet li meydana xebatê çol nekirin, ewe bûye daxa ser dilê karbidestê hikumeta Îslamî, bûye her cihekê we zext û fîşar bo bê ew dibêje xetayê Rojhilatê Kurdistanê û li nava Komara Îslamî jî xetayê Sazî û hizbên Kurdistanê ye.

Dene her keseke ku Elif byên sîyasetê bizane,li cihê ku xebata cemawerî û medenî gelî hebe,nabe çek û hêzên çekdar biçine urtê û bikine meydana şerê çekdarî.

dujmin va hizr dikir ku hêzên pêşmerge dê biçine nava bajaran ew jî bi hemû qaweta xwe li erdî û esman û biçekên giran Rojhilatê Kurdistanê dê wêran bike? Kes jî ne li Îranê ne li dûnyayê çinabêjin, bigire biheqê wî jî dê bizanin, lê, wextê dît ku wisa nebû xast bi mûşkbaranên binke û bargahên hizbên rojhilatê bike û wan bikêşe nava meydana şer,?! Lê Navenda Partiyên Rojhialtê Kurdistanê her zû ew pîlana rejîm bi başlî xwandin û analîze kirin, ragehandin bi hîç şêweyekê pêşmerge tevlî nava serhildanên Rojhilatê Kurdistanê nabin? Bûye ew pîlana rejîm jî betal bû. Niha jî hertim dixwaze wirde wirda şerekê peyda bike tev hêzên Rojhilatê Kurdistanê daku bikare navxwe û derwe bîne ser wê şerî ,daku bikare bi keyfa xwe serkut û tepeserî yê çê bike li nava welat de. Heta niha ew pîlana wî sernegirtiye û gelek tûreye, rejîm tûşî şikaneke mezin bûye, gelên Îranê êdî çawnetirs bûne, sûkan û şeqaman çol nakin, hemû qatên civaka medenî û îdarî û kirêkarî û xwandevan û qûtabî bikurtî têkaraya civaka Îranê li ser xetê ye û stûnên Komara Îslamî diheje. Raya giştî ya cîhanê li ser xet e, wek caran bêdeng ninin. Ewane gelek tiştên din jî ku li dûvarojê dê bêne pêş, stêrka emrê rejîm ber bi ava bûnê diçe, dibêjin ku mirov eger li kendalekî mezin û bilind bikeve xwarê, mecbûrî destê xwe bo hemû tiştekê dibî ku xwe pê bigirî, lê, niha ew jî êdî bo wê rejîma sedsalên Navîn nemaye,bixwe û nexwaze roja wî êdî ber bi şeveke tarî vê diçe, gelên Îranê bixasmanî Rojhilatê Kurdistanê ber bi bilindî serfirazî dê ber bi serkeftinê ve diçin.

**Serkevtin her bo gelên bindeste,**

**Sipas**

**Rostem Cihangîrî**
**Berpirsê Navenda Çavdêrî ya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**

# Şorişa bi îrade ya gel



N: AZAD KURDÎ



Gelekê ku şiyan û karînên xwe nas kir û bawerî bi xwe peyda kir û nîrê zordarî û dîwarê tirs ji dîktator şikand, êdî çi hêzek nikare dereqeta wî gelî bihê û xwe li ser ferz bike. Ji sala 1979'an vir de, cîhan rûbirûyê rêjîmeke Îslamî ya herî hov di dîrokê de bû ku Xomêyniyê cinayetkar serkêşiya wê kir xîm û bengeha wê rêjîmê li ser hovîtî û tund û tûjiyê ava kir û 43 sal in bi kuştin, îşkence, îdamkirin û binkêkirina mafên mirovan bi awayê herî berçav û berfireh, asteng-kirina hemû azadiyên demokratîk xwest bi tirsandina gelên Îranê, desthilatdariya xwe ya gemar bidomîne.

Di van 43 salên borî de Rojhilatê Kurdistanê nirxên herî zêde dane, ji ber ku Kurdistan take navçe bûye li Îranê ku heta roja îro jî xebat bi hemû awayên mumkin li dijî vê rêjîmê û bidestve anîna azadiyan berdewam dike.

Dibe ku rêjîma Îranê bikare heta demeke kurt temenê tejî hovîtî û cinayetkirin a xwe bidomîne, lê ev îrade û hêza xurt û şorişa ser rê û cadeyan ku piştî şehîdkirina Jînayê hate destpêkirin, bi hêsanî nayê komkirin. Ya ku mirov ji serkevtina vê şorişê piştrast dike, yekdengî û yekîradebûna gelê me li Kurdistanê ye ku tilismê xofçêkirin û hovîtiya rêjîma Îranê bi dawî anî û îro keç û lawên kurd bi xwîna xwe dara azadiyê av didin.

Gelên Îranê têhniyên azadiyê ne û rêjîma Îslamî ya Îranê jî dijbereke sereke yê azadiyên takekesî û demokratîk e. piştî 43 salan, ne tenê bo gelên Îranê, lê bo van kes û koman jî ku di eçnd qonaxan de dilê xwe bi şano û senariyoyên refomîstî yên hindek rayedarên rêjîmê xweş dikirin, niha êdî ev taqim û kes jî gihîştin vê baweriyê ku rêjîma Îranê nikare qet guhertinan di navxwe de pêk bîne û ev şano jî zêdetir hewildan bona dirêjkirina temenê rêjîmê bûne. Lewma encam dibe ev ku gelên Îranê ku bi xurtî têhniyê azadiyê ne, dê vê rêjîma hov têk bişkînin û dawî bi desthilatdariya wê bînin

Misogerbûna vê têkçûn û nemana rêjîma Îslamî ya Îranê û hilatina roja ronak û asoya geş demekê mirov hêvîdar dike ku ev rêjîm di asta navxwe de xwedî çi pêgeheke civakî nîne û nemaye. Belkî demeke dirêj van bi derew û fîlbaziyan hewil dida ku raya giştî ya cîhanê bi vê yekê bixapînin ku ev rêjîm xwedî pêgeheke qahîm e di nava civaka Îranê de û qaşo siyasetên wê tên hezkirin û qebûlkirin! Lê bo raya giştî li derveyî Îranê eşkere bû ku ev yek hemû derew bûn û pêgeha wan bi qasê poldifankeke hewa bû. Ji ber ku rayedarên cinayetkar ên rêjîmê difikirîn ku bi kuştin, îdamkirin û îşkence û girtinan û binpêkirina mafên mirovan, dikare wan bitirsîne û xwe li ser gelan de ferz bike, ev siyaset belkî bo demeke kurt bersivder bû, lê domkirina vê rewşê, nebûna çi azadiyeke siyasî û demokratîk , aboriyeke herifî û kavil, bihabûna xeyalî ya pêwîstiyên jiyanê û pêkhatina kirîzeke aborî ya herî dijwar di 40 salên borî de, gel anî ser vê baweriyê ku bi îradeya xwe dibe ji vê rêjîmê derbas bibin û jiyan û çarenivîseke nû ava bikin. Em êdî wan rojên geş bi çavên xwe dibînin.


# Du girtiyên Belûç li girtîgeha navendî ya Zahidanê hatine bidarvekirin

Li gor Kempeyna Çalakvanên Belûş, sibêdeha îro roja Duşemî 14ê Sermawezê, du hevwelatiyên Belûç ku berê bi tohmeta "madên hişber" hatibûne cezadan, hatine îdamkirin.
Nasnameya wan du girtiyan bi "Nasir Umerzehî" yê 32 salî û kurê Çirax û xelkê bajarê Xaşê, û "Elîriza Naroyî" yê 39 salî û kurê Mihemed û xelkê Zahidanê û rûniştiyê bajarê Xaşê hatiye zanîn.
Hatiye zanîn ku di halekê de ew girtiyane hatine bidarvekirin ku ne malabata wan hatine agehdarkirin û ne jî dawî hevdîtina wan digel malbatên xwe hebûye.
Li gor amara Kempeyna Çalakvanên Belûç, li sala 2021an zêdetir ji 79 Belûç di girtîgehên rejîmê de hatine bidarvekirin.

Gelên Îranê têhniyên azadiyê ne û rêjîma Îslamî ya Îranê jî dijbereke sereke yê azadiyên takekesî û demokratîk e. piştî 43 salan, ne tenê bo gelên Îranê, lê bo van kes û koman jî ku di eçnd qonaxan de dilê xwe bi şano û senariyoyên refomîstî yên hindek rayedarên rêjîmê xweş dikirin, niha êdî ev taqim û kes jî gihîştin vê baweriyê ku rêjîma Îranê nikare qet guhertinan di navxwe de pêk bîne û ev



## Nerîna Lîderan



**“Sanna Marin:”**

Şerê Ukraynayê nîşan da ku Ewrûpa bihêz nîne.



**“Mesrûr Barzanî”:**

Çandinî bingeha aboriya bihêz a her welatekî ye.



**“Anthony Blinken”:**


Raporên derheq hilweşandina polîsê “Geşt Îrşad” a Komara Îslamî ne zelal in.



**“ Mohsen Mirdamadî”:**

Xelk sîstemê bi giştî û reformxwaz jî di nav de nabîne ku bikaribe daxwazên xwe pêk bîne.

## Li Neteweyên Yekbûyî û Yekîtiya Ewrûpayê tevgerên li dijî Tehranê bihêz dibin!



**N: Eskender Ceiferî**

Komeleya Mafên Mirovên Kurdistanê li Genevê ji Neteweyên Yekbûyî dixwaze li dijî rejîma faşîstên Tehranê tevbigere.
Parêzvanên Mafên Mirovan, Ensemble Contre la Peine de Mort, û Komeleya Mafên Mirovan a Kurdistanê-Genev piştgirîya avakirina şandeyeke navneteweyî ya serbixwe ya lêkolîna rastiyan li Îranê dikin.

Di daxuyaniya wan de hatiye: Ji dema ku xwepêşandanên li seranserî welat piştî şehîdkirina jina ciwan a Kurd Jîna Emînî dest pê kirin, desthilatdaran zêdetirî 400 kes şehîd kirine, ji wan 50 zarok û 27 jin.

Rayedaran bi hezaran kes ji ber ku tevlî xwepêşandanên aştiyane bûne binçav kirin. Wan bi kêmî ve şeş kesên ku bi xwenîşandanan re têkildar in, li ser bingeha sûcên nezelal ên şerê li dijî Xwedê an gendeliya li ser rûyê erdê, cezayê darvekirinê dane.
Em ji ber bikaranîna hêzeke zêde ya desthilatdaran li dijî xwepêşanderan, bi taybetî li parêzgehên Belûçistan û Kurdistanê, gelekî nîgeran in. Bi kêmî ve 126 xwepêşanderên Belûcî û 100 xwepêşanderên Kurd ku di nav de jin û biçûk jî hene, hatine kuştin. Bajarên Kurdan ên Mehabad û Cûwanrûd hatine mîlîtarîzekirin û gel bi xetereya komkujiyê re rû bi rû ye.

Em her wiha bi tundî windakirina bi zorê ya xwepêşanderên birîndar û kuştî û redkirina rayedaran ji dayîna cenazeyên kuştiyan ji malbatên wan re şermezar dikin.

Xwepêşandan û protestoyên serhildana Îranê berdewam in û ew dibêjin ku hêzên tepisîner ên Komara Îslamî hemû şêweyên tundûtûjiyê li dijî xwepêşanderên aştîxwaz bi kar tînin. Herwisa bi dehan sedan xwepêşanderan li Îranê bi teqeya rasterast ya hêzên rejîmê hatine şehîdkirin û bi hezaran kes jî birîndar bûne. Hêzên zordar ên rejîma Îslamî ji gaza rondikrêj heta guleyên şer û gelek şêweyên tepisandinê yên din li dijî gel bi kar tînin. Di encama tundûtûjîyan de bêtirî 200 kesan di serhildanê de hatin şehîdkirin û bi sedan kes birîndar bûne. Li gor ku Rêxistina Efûyê ya Navnetewî dibêje, di nava kesên ku jiyana xwe ji dest dane de herî kêm 23 zarok jî hene.
Xwepêşanderên Kurd li Ewrûpayê jî di daxuyaniyekê de ragihandine ku hêzên navbirî yên rejîma Komara Îslamî roja 9’ê Cotmehê li bajarên Sîstan û Belûcîstanê êrîşî ser xwepêşandanên aştiyane yên gelê Zehidanê kirin û di encamê de zêdeyî 100 kesan ji serhildêran jiyana xwe ji dest dan. Hin ji kesên jiyana xwe ji dest dane, zarokên kêmî 18 salî bûn ku yekser gule li wan hatin reşandin.

Hêzên zordar ên Komara Îslamî li Tehranê jî êrîşî zanîngeha Şerîf kirin û çend demjimêran zanîngeh dorpêç kirin. Ew jî piştî protestoya xwendekaran û bi danîna kemînan ji bo xwendekarên dihat û tê de di encamê de hejmareke mezin ji xwendekaran hatin binçavkirin û ji wan xwendekaran jî li wir hatin birîndarkirin.

Tawaneke din a Komara Îslamî êrîşa li ser girtîgeha Êvîn a li Tehranê bû. “Êvîn” bi kiryarên dijmirovahî yên li dijî girtiyên siyasî û çalakvanên biyanî yên ku di zindanê de tên ragirtin navdar e. Tê gotin ku bi sedan welatiyên binçavkirî yên vê dawiyê jî li vê girtîgehê ne. Di encama vê êrîşê bi dehan girtiyan jiyana xwe ji dest dan.

Mafê jiyana azad, jiyaneke bi rûmet û hebûna mafên siyasî û civakî, beşeke bingehîn a mafên mirovan ên vê serdemê ye. Mafê ku ev 43 sal in ji aliyê rejîma Komara Îslamî ve tê zewtkirin û ji gelên Îranê hatiye standin.

Niha ku em li vir kom bûne, piraniya bajar û deverên Îranê ji Kurdistanê heta Belûcistanê, ji Ehwazê heta Azerbaycanê, ji Gîlanê heya Tehranê, Îsfehan, Meşhed û bajarên din bi tundî ji aliyê rejîma Komara Îslamî ya Îranê ve tên tepisandin û her kêlî em şehîdkirina kesekî ji aliyê rejîmê ve dibînin. Komara Îslamî hemû riyên têkilîdanîna bi mirovên derveyî Îranê re jî girtine. Niha gelek dijwar e ku bi bajar û navçeyên curbicur yên Îranê re têkilî çê bibe û Komara Îslamî ya Îranê bi qutkirina înternetê û rêyên din ên girêdana gel û çewisandina raperîna gelên Îranê hewl dide ferzkirina dîktatoriya xwe li ser gelên Îranê bidomîne.

Rejîmê di nava zêdetîrî 40 salên xwe de hem li hundir hem jî li derveyî welat xwe ji ti sûcî neparast. Di hundir de bi darvekirin, girtin û binçavkirina mirovan jiyana xwezayî, azad û bi rûmet ji gelên Îranê standine. Ev rejîm li derveyî Îranê her tim piştgiriya têrorê dike û bi rêxistinkirina komên tundrew bûye metirsiyeke mezin li ser ewlehiya welatan û aştiya cîhanî.

Dirûşma “Jin - Jiyan - Azadî” bûye sembola têkoşîna neteweyên Îranê û hemû çînên civakê li dijî wê desthilata dîktator û hemû netewe, kêmneteweyên netewî û olî yên Îranê ku Kurd, Fars, Tirk, Belûç, Ereb, Turkoman, Beha’î, Sunî û yên din in, bi yekdengî dixwazin rejîma Îranê hilweşe û hikumeteke demokratîk li ser bingeha Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan were avakirin.

# Rojavayê Kurdistanê di navbera dagîrkerî û êrîşên Tirkiyê de



N: Ebdûlazîz Qasim




Tirkiyê, piştî destwerdana xwe ya leşkerî di Sûriyê de û dagîrkirina navçeyên berfireh ji Kurdistana Sûriyê, destwerdana di karûbarên Lîbyayê û di nakokiyên navbera Azerbaycan û Ermenistanê de û bi taybetî ji bo piştgiriya wê ya bo grûpên îslamî yên tundrew re, ketibû di îzolasyonek "dorpêçek" navnetewyî û erebî de.

Lê dîsa, piştî şerê Rûsya û Ukraynayê, karî têkiliyên xwe careke din bi gelek welatên Erebî û Îsraîlê re dubare bike û hewl dide ku destkeftiyên zêdetir yên siyasî, leşkerî û aborî ji hevalbendên xwe yên di hevpeymaniya NATO de bistîne, nemaze piştî vegerandina peywendiyên xwe bi dewletên NATO û bi taybetî bi Amerîkayê re û ji aliyek din bi Îranê û Rûsiya re, bi taybetî di derbarê dosyaya Sûriyê de, ku Tirkiyê çendîn daxwazên nû pêşkêş dike, û asta daxwazên xwe bilind û zêde dike, di hewlekê de ku destkeftên herî mezin bidest bixe bi taybetî ji bo tinekirina pirsa neteweyî ya kurdî li Rojavayê Kurdistanê, û ev yek xuya dibe ji bêdengiya her yek ji Amerîka û Rûsyayê bê li hember radestkirina herêma Efrînê bo Heyet Tehrîr El-Şam û êrîşên wê yên bi dron û firokeyan li ser deverên di bin kontrola QSD de.

Goman di wê yekê de nîne, ku Tirkiyê piştî dagîrkirina navçeyên berfiref ji Rojavayê kurdistanê, dê hewl bide her derfetekî bikarbîna ji bo timamkirina dagîrkirina hemû navçeyên din yên kurdan û jinavbirina gelê kurd û pêkanîna pirojeyên xwe yên ji bo guhertina demografîk, û niha şerê wê yê li ser navçeyên di bin kontrola QSD de, û wêrankirina jêrxaneya aborî û saziyên bajêrvaniyê kêmtir ji dagîrkeriyê nîne, û helbet çi demê derfet jêre peyda bibin dê dest bi êrîşên bejayî jî bike, tevî ku ev êrîşên Tirkiyê yên vê dawiyê dikevin di berjewendiya rêjîma Îranê de ya ku di qeyranek mezin de derbas dibe û bêtir ji du mehan rûbirûyî şoreşek cemawerî tê, bi taybetî li Rojhelatê Kurdistanê ku roj bi roj agirê vê şoreşê geştir dibe, lewra xuya dibe ku hevahengiyek bihêz di navbera rêjîma Tirkiyê û Îranê de heye, bi taybetî li ser pirsa neteweyî ya kurdî li seranserê Kurdistanê.

Her ji aliyek din ve, rayedarên bilind yên Tirkiyê bi awayekî rojane daxuyanên nerim didin ji bo dubarekirina têkiliyên xwe ligel rêjîma Sûriyê, lê heta niha wekî xuya dibe, ku rêjîma Sûriyê ti bersivek li hember vê daxwaza Tirkiyê nedaye, ku îro Tirkiyê dixwaze bi awayekî fermî têkiliyên xwe ligel Şamê dubare bike û bi taybetî ji bo rêbigire li pêşiya her rêkeftinekê di navbera aliyên kurdî û rêjîma Sûriyê de.

Li hember hewldanên Tirkiyê yên berdewam ji bo dagîrkirina tevaya Rojavayê Kurdistanê, pêdivî bi siyasetek kurdî ya aqilmendî heye, bo xwendinek nû heye dûr ji kêşeyên desthilatdariyê yên di navbera rêjîm û opozîsyona Sûrî de, bi taybetî ku opozîsyona sûrî bi ti awayekî baştir ji rêjîma Sûriyê nîne, heta radeyekî ku şofînizmtir e jî, nemaze wekî xuyaye ku rêjîma Sûriyê dê bi piştgirîya Rûsiya heta demekî nediyar wê bimîne, lewra miletê me yê kurd pêdivî bi bereyek niştîmanî ya kurdî heye û têde hemû aliyên siyasî, leşkerî, civakî, rewşenbîrî û zanistî cihê xwe bigirin ji bo rê bigirin li hember pirojeyên dewletên dagîrkerên Kurdistanê û bi taybetî piştî xweragirî û berdewamiya şoreşa Rojhelatê Kurdistanê tevî serkutkariya rêjîma Îranê û tawanên wê yên hovane li dijî gelê kurd.

Lê. vê şoreşê tirsek mezin xistiye di dilê dagîrkeran de bi taybetî di dilê herdu rêjîmên dagîrker Tirkiyê û Îranê de, û helbet serkeftina vê şoreşê dê trazûyên berjewendiyan yên herêmî û navdewletî biguherîne û divê

# Li derheq têgeha îbadetê



N: Vênûs Fayîq
W: Hesen Mukerem



Wî berî hezaran salî sînûrek ji bo te xêz kiriye û ji te ra dibêje mafê te nine bikevî, ne ji ber derbaskirinê bikevî, ev sînûra, bingehên ayînê ne: Yekem: Qora`an, duyem: Nerîtên pêxember, sêyem: Umeta pêxember, çarem: Biratiya di navbera mislmanan de, pêncem: Azadbûn li kaferan, şeşm: Umeta Îslamê baştirîn(xêr) umet e bo xelkê ku hatine. Û bi awayek zelal Xwedayê bê şirîk û tenê, dawîn pêxemberên Xweda ne.

Girîngtirîn pirs ku me ji zarokan kiriye, Xweda çawaye? Çima em wî nabînin, ku hertim me xirabtirîn bersiv ji wan re daye û ji wan re gotiye Xweda di esman de û di dunaya din de dighîjinê..

Em ji aliyê fîzîkî ve dizanin ku çawa hatine afirandin, lê, ji aliyê hizrî û hizrkirina xwe ve nizanin emê mirov çawa gihîştin li ser rûyê wî erdî.. Hertim biwe û tabû bûye ku ji vê yekê zêdetir herin û di pirsên xwe de zêdereviyê bikin û bigihîjin bi wî sînûrî ku ji bo me hatiye xêz kirin, çimkî pêş ji vê ku me sînûr derbas kiribe gef ji me xwarine û em tirsandine û sizayên xwe di hizra me de cih kirine..

Her bi navê peyva (Îslam) ê weke ku li (Wîkîpêdiya) de hatiye: Îslam bi wateya îstslamê ye, wate xwe radestkirin.. Her ev jî ku di bingehê de tên ser bingeha xwe radestkirin û zelûl bûn û ser tewandin û xwe bikêmzanîn dirust bûye, heta bi awayê nûjenkirinê jî, ku, pêk tê li dest bilindkirin û hêvîkirin, ser nişîvkirin, wate sernişîv bûn di asta ayînê de, ku, sicde birin bi wateya ser tewandin bo Xwedayekê ye ku nizanin heye an na.

Evan e hemû wisa ji kesayetiya mirovên ser bi vê ayînê kiriye ku bibin canliberekî zelûl û sertwandî û gêj û bêdesthildat ku hertim hêvî bi felsefeyê dikin û bo xazokîkirinê beraxwe didin bi afirîndeyekê ku tenê navê wê bihîstine, an canliberek ku yên din tenê di çarcoveya koletî û lawaz û xazoker û ser tewandinê de dibîne.

Her bi vê sedemê ye ku ev civakên ku hertim ev ayîna di hundr de belav e, girêyeke kor hertimî di navbera hakim û mehûum de heye, cudahiyeke bikuj di navbera xwedî desthildat û netewe de heye, desthilatdar bi wateya serwerî û serdar û hêz û desthilat û tundûtîj, mehkûm bi wateya koletî û celebî û stû xwarî û paremayîn..

Tevahiya civakê li ser wan bihêz û tevlîhevî û xwadî desthildat û li hember birêveber û bê îradekirin û sergêjiyê de parve dibe.. Li koma ku di gel wan de ne ti cihek bo maf û azadiyan nine, pirs kirin û berfirehkirina sînûrê hizrkirin û zelalbûn qedexe ye, çimkî dizanin hizrkirênên zêde û pirskirinên zêde li derheq zanyarî, bidûreçûna heqîqetan nêzîk dike û te hîn dike ku bihêz bibî û yê din erê nekî û bibî bi xwediyê kesayetî.. Ev yek jî digel pirensîp û felsefeyên civaka Îslamê nagonc e.

Hizr û baweriyên ayîna Îslamê li ser pênc xalan in ku ev jî wiha ne: Xweda, Pirtûkên pîroz, Pêxember, roja qiyametê û qeza û qeder... Di wan pêncan sê ji wan (Xweda, Roja qiyametê û Qeza û qeder) zêdetirîn pirs û lêkolîn û guman li peyî xwe tînin, ev jî wan sê dane betal dike duyên din(Pirtûkên pîroz û Pêxember) ku, ev herdu jî bi heman awayî aliyê kêm pirs dike: Ev pirtûk çawa taybetmendiyên pîroz yên wan behs dike? Çi kesekî hizr li peyamên vê kiriye? Çawa hatine tomar kirin? Çawan gihîştinê? Çi kesekî ev şandine? Çi kesekî ev wergirtine? Çi kesekî ev hilbijartine? Çi kesekî Pêxember dest nîşan kirin? Helbet bersiva wan herdu pirsan(Xweda) ye.. Lê, dawîn car eva jî gumanên zêdetir digel xwe tîne..

Yek ji wan tiştên ku her di deskpêkê de li ser mirov de hatiye sepandin “perestandin”e, her perestinandina Xweda bigire heta digihîje bi berpirsên hizbî û xwedî desthilatdar û yên li serweyî me bixwe ku em dibînin, an zelaltir bêjim em xwe ji wan kêmtir dizanin û bilî li zeq kirina helbestvan û nivîskaran û ev kirine xweda..

Eger ez kesek ji xwe mezintir nezanim ev bi vê wateyê nine ku ez xwe ji wan mezintir dizanim, wateya vê eve ku rêz ji xwe digrim û ti kesî nizmtir û kêmtir ji xwe nizanim. Digel wana jî, niha li dijî ayîn diaxavin ku kesek heye diperestin weke, daliqandina wêneya helbestvanekî an nivîskarekî bi awayek mezin û mezinkirina wê bi zorê ye,di demekê de ku dibe te rêz û hormet ji wî\ê re hebe, neku wî\ê ji xwe re bikî bi xweda..

Di van civakên ku ti rêz û nirxek bo mirov û kramet û azadî û mafên mirov tuneye, diyardeya perestandinê gelek zeq dibe.

# Rûpelek nû



N: Selîm Zencîrî Berpirsê Navenda Hilbijartina PDKÎ

Serhildana dîrokî û bêhempa ya gelên Îranê li dijî dîktatoriya rejîma terorîstî ya Îslamî ya Îranê bi durûşma ''Jin, Jiyan Azadî'' bi qaweta xwe berdewam e û di 80'mîn roja vê serhildanê de, rûpelek nû ji hevxebatî û hevpêwendiya di navbera xelkê Îranê hate vedan.

Hevxebatî û yekîtiyek ku serbarê rewşa mîlîtarîstî û tepeserî, gef, çavsorî, propagende û pîlanên curbicur yên rejîma Îslamî ya Îranê di şeklê gireva giştî a sernaserî de xwe derxist. Metodek medenî, şaristanî û cîhanpesend ji xebatê ku kêmtêçû, lê di heman demê de bibandor û karîger e, hêviyên serkevtinê vedigeşîne. Ji berku civak bi parvekirina nexş û rol û herweha têçûya serhildanê di navbera xwe de, şoreşê giştgîr û rîşedartir dike û herweha fokûsa rejîmê û hêzên tepeserkar ên wê li ser dever û texek cuda ji serhildêran têk dide.

Eve ye ku em dibînin serbarê hemû kumpilo û senaryoyên qirêj ên rejîmê bona fetisandina serhildanê û tirsandina xelkê ji parçebûna Îranê û herweha cehdên afirandina dubendî û nifaqê di navbera gelên Îranê û girêdana vê serhildanê bi fakterên derekî re, lê şoreş riya rastîn a xwe dipîve û gav bi gav dîwarê bêbawerî û netifaqiyê ku rejîma hov endazyar û afirînerê vê ye, diherifîne û guriya xebata li dijî rejîmê geş dike.

Ezmûna vê serhildanê, durûşm, hevxebatî, hevpêwendî û gireva ku di 80mîn roja serhildana Jînayê di seranserî Îranê de hat dîtin, tirs û wehşetek mezin xistiye nav dilê rejîma hov û xedar ya Îranê de.

Tirs û nîgeraniyek ku hemû sermayeguzariya ku di 43 salên derbasbûyî de bona ji hev veqetandina refên civakê, pûç û vala derxist. Rejîmê bi tepeseriyên hovane li Kurdistan û Belûçistanê de, xwast ku dever û netewên din çavtirsayî û wan li kuncên malên xwe de asê bike, lê gireva giştî ku li 14ê Sermawezê li piraniya bajarên Kurdistan û Îranê de pêk hat, xincî wê ku rûyek piraktîk da durûşmên manadar ên paytexet û bajarên din bona piştewanîkirina ji deverên gevzandî di nav xwînê de, û herweha ew Hene (Xenê) ya ku rejîmê bona tenêhiştin û tepeserkirina wan her du gelan girtibû, rengê xwe ji dest da, û girîngtir ji wê jî, serhildana li dijî rejîmê derbasî qonaxek nû kir ku alîkariyek mezin dide pêvajoya herifîna rejîmê, ger ku wusa berdewam bike.

Lewma hewce ye ew ruha hevxebatî, tilorans û yekîtiya ku her roj zêdetir xwe nîşan dide, wek deskevt û sermiyanek mezin were parastin û pêngavên mezin û micid bona xurt û bihêzkirina wê bihên avêtin.


Bi giştî rejîm li vê qonaxa çarenivîssaz a serhildana gelên Îranê de, hewil dide bi girtin, kuştin û gef, çavsorî, propagende, mûşekbaran û ...hwd, çeka bibandor û




herifîner a yekîtî û hevxebatiyê ku xwe li gireva giştî a seranserî de nîşan dide, ji serhildêran bistîne û pênaseyek nerênî û têkder bona dirêjkirina temenê xwe bide vê serhildana pîroz ku keça kurd (Jîna) remza wê û Kurdistan û jinên Kurd jî alahilgir û pêşengê vê serhildanê ne, lewma hewce dike tevî parastina cewhera aştîxwazane a serhildanê, tevgera siyasî û serhildêr tevî berdewamîdana bi xebat û berxwedana li ser şeqaman, girîngiyek zêdetir bi gireva giştî weke çeka herî bihêz û karîger a serdem bidin, ji berku him têçûya mirovî a serhildanê kêm û li ser tex û qatên curbicur ên civakê parve dike û bargiranî û tepeseriya li ser tex yan neteweyek cuda û diyarîkirî ji civakê sivik dike. Herweha bala hemû tex û qatan bo beşdariya di serhildanê û lîstina rola xwe zêdetir dikşîne.

Herweha çavkaniya aborî û dahata rejîmê û hêzên tepeserkar ên wê weke Spaha terorîstî a Pastaran ku xwe di liv û tevgera bazarê ji riya qorix û monopolkirina wan de dibîne, kor dike. Tevî wê ku zirarê dide xelkê asayî jî di van girevan de, lê têçûya serhildanê li ser hemû xelkê parve dike.

Di encama berdewamiya vê metoda xebatê de ye ku pêlên yekîtî û hevxebatiyê bihêz û refên civakê jî yekgirtîtir dike. Bêguman rejîm jî îzoletir û şeqar û werînê dikeve nav refên hêzên tepeserkar ên wê û hêviyên serkevtinê geş û geştir dike.



# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Çar çalakvanên sendîkaya mamosteyên Dîwandereyê bi girtîgehê hatine cezakirin

Umîd Şamihemedî, Perwîz Ehsenî, Kawe Mihemedzade û Hîwa Qureyşî ji Endamên Encumena Sendîkaya Mamostayên Kurdistan-Dîwandere ji aliyê taya 1 a Dadgeha Şoreş ya bajarê Sineyê ve hatin cezadan.

Li gor vê hikma hatî sepandin, Umîd Şamihemedî bi tohmeta “hewldan li dijî ewlehiya netewî bi rêya endamtiya partiyeke Kurdî” ve, bi 5 sal girtîgeha te`izîrî û bi heman tohmetê jî, Hîwa Qureşî, Perwîz Ehsenî û Kawe Mihemedzade bi 5 sal girtîgeha ragirtî (Te`ilîqî) hatine cezadan.

Roja Sêşemî 8ê Xermanana îsal jî, ew 4 endamên Encumena Sendîkaya Mamostayên Kurdistan-Dîwandere, piştî 76 roj binçavkirinê, bi danîna barimteya 6 milyar Tumenî ji girtîgeha Îtilaata Sineyê hatibûne berdan.

## Dêwolan: Suhêyla Mutaî bi girtîgehê hate cezadan

Suhêyla Mutaî, welatiya Kurd ya xelka bajarê Dêwolanê, ji aliyê taya du ya dadgeha kêyferî ya vî bajarî ve bi girtîgehê hat cezadan.

Pêka cezaya hatî birîn, Mutaî bi tohmeta “çêkirina aloziyan di nav nizima giştî de” bi 15 meh girtîgeha teizîrî, û “alozkirina hizra giştî ji rêya belavkirina belavokên vala” bi 13 meh girtîgeha te`izîrî” û  herwisa “şer li dijî meimûrên hikûmetê”, bi 5 meh girtîgeha teizîrî û “piropagende li berjewendiyên girûp û saziyên li dijî nizamê” bi 9 meh girtîgeha teizîrî hatiye cezadan.

Pêka yasaya çendîn cezayan, cezaya 18 meh girtîgeh bo wê welatiya Kurd şiyana birêveçûnê heye. Suhêyla Mutaî di dadgeheke çend xulekî de bi şêweza vîdyo konferansê hatiye dadgehîkirin.

Roja Şemî 21ê Xezelwera 1401an, Suhêyla Mutaî dubare ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û piştî bi dawîhatina dewrên lêpirsînê bo Navenda Çaksazî û Perwerdehî ya Sine hatibû veguhastin.

Ew welatiya Kurd 9ê Rezberê jî, ji aliyê hêzên ewlehî yên hikûmeta Îslamî ya Îranê ve hatibû binîçavkirin û 25ê Rezberê bi danîna barmteyê hatibû azadkirin.

## Welatiyek Kurd li Dêwolanê bi 69 meh girtîgeh hate cezadan

Çalakvanekî medenî yê bi navê “Mehdî Cewanmerdî” yê xelkê bajarê Dêwolanê ji aliyê taya du ya dadgeha Keyferî a wî bajarî ve bi 5 sal û 9 mehan girtîgeh hate cezadan.

Pêka wê cezayê, ew çalakvanê medenî bi tohmeta “piropagende li dijî nizam”ê bi 9 mehan girtîgeh, “têkdana tenahiya giştî” bi 18 meh girtîgeh û “têkdana ewlehiya netewî” bi 42 mehan girtîgeh hatiye cezadan.

Ev çalakvanê medenî di heyama vê dadresiyê de ji destpêragihîştin bi parêzer hatibû bçparkirin û bi rêya vîdyo konfêransê ve çend xulekan li dadgehê de hate cezadan.

Roja Duşemî 4ê Rezbera 1401an a Rojî, Mehdî Cewanmerdî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û piştî bi dawîhatina heya lêkolîna wî, ji girtîgeha ewlehî ya bajarê Sinê bo girtîgeha navendî ya wî bajarî hatibû veguhastin.

Navbirî niha di girtîgeha navendî ya bajarê Sinê de ye

## Bidarvekirina girtiyek li Îlamê

Sibêdeha roja Çarşemî 2ê Sermawezê, cezayê bidarvekirina girtiyekî Kurd yê bi navê “Mehdî Lotfî” û kurê Hacî Baba Lotfî û xelkê bajarê Eywanxerbê, li girtîgeha bajarê Îlamê hate cîbicîgirin.

Ew girtiye berê bi tohmeta “kuştina bi zanebûn” a du welatiyên xelkê gundê “Kelan” yê bajarê Eywanxerbê hatibû binçavkirin û piştre ji aliyê dezgeha dadweriyê ve bi îdamê hatibû cezadan.

Mehdî Lotfî xelkê gundê “Xuran” yê ser bi bajarê Eywanxerbê ye.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (435)

## Wêneyên gireva seranserî ya dukandar û bazariyan li Kurdistan û Îranê





